

Êdî Spaha Pasdaran

behsa wan mûşekan dike ku
parzemînan derbas dikin

»»» R:7



Maka terorîzma cîhanê

»»» R:4




*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (386) 22-11-2020 Buha (1000) Tûmen


Xeta xwar di bin
serê gayê pîr de

»»» R:5



Hewldanên vajîkirina
pirsa Kurd

»»» R:8



Salek piştî kuştare

Serhildan û
xwenîşandanên
xelkê Îranê li rojên 24
heta 30`ê Xezelwera
sala 1398`an a Rojî, li
zêdetir ji 100 bajarên
Îran û Kurdistanê, wekî
birûskeke li esmanê
bimij û dûman a Îrana
li jêr deshelata “Wilay-
eta Feqîh” de bû, ku bû
sedema nîşandana kerb
û bêzariya kelekbûyî ya
ser hev a 40 sal zulm,
enfelansyon, binpêki-
rina mafê mirovan,
kuştar û..hwd.

Çirûska wê serhildanê,
bi sedema bilindbûna
nirxa benzînê ya %300
bû, ku jiyanê %80 a
xelkê rastî aştengiyên
kir.

Zext û bileziya wê
serhildanê ew qas ji
nişkêve bû, ku rêberê
cinayetkar û xwînrij
ê rejîmê bi komkirina
fermandên Spaha Pas-
daran û Besîcên bizdi-
yayî ji tirsê herifîna re-
jîmê, ferman da ku bi
her awayekî ku ji destê
wan tê, xelkê azadîx-
waz serkut bikin.
Pêka wê fermanê,
hêzên serkutkar pêk
hatibûn ji Spaha Pas-
daran, besîc û hêzên
ewlehiyê, û kincşexsî
û çeçokêş û mirovkuj,
ku ji aliyê Spaha Pas-
daran ve bo kuştara
xelkê hatibûne birêkx-
istinkirin, û hin çek û
çol bi kar anîne, ku ew

çek û çol ji aliyê Konvansiyona Navneteweyî ve hatibûne qedexekirin, û canê xelkê bêberevan kirine
armanc, û di navbera 5 rojan de hezaran kes li ser şeqaman, girtîgehan, rûbar û bendavan û di nav
qamîşan de kuştin, ku di navbera wan de zarok jî hebûn.

Rejîmê bi bikaranîna çekên tîrbar, qinase, tifengên saçmeyî, kuştina girtiyan, êrîş bo ser dukanan, agir-
berdana bankan û bi gîştî destbirina bo her cinayetekê, xelkê azadîxwaz bédeng kirin.

Wan di wan rojan de nîşan dan, ku ji her hesteke mirovî dûr in; Bi vî awayî wan karî dengê azadiya



xelkê bêzarbûyî serkut bikin, lê bi alîkariya torên civakî û hezaran vîdyo û dûmen ji xwenîşandana
rewa a xelkê, dûmenê dilêş yê wê serkuta dirindane tomar bikin, û propagandeyên rejîmê ya fêlbazane
bikin bilqa ser avê, û rûyê rêformxwazî ku îro rantxwarên rejîmê ne, bo xelkê eşkere bû.
Di xwenîşandana 1398`an de, qata hejar a civatgehê ku niha digel hejarî û destengiyê rû bi rû ne, û
herwisa qatên wekî mamoste, bazariyan, xwendekar û ajotvanan, û ...hwd ku niha bêzar bûne beşdar
bûn, û siloganên wê xwenîşandanê nîşan dan ku xelk tevî vê ku bi sedema bilindbûna nirxa benzînê
hatin ser şeqaman, lê tewahiya rejîma Îranê ku sedemê çarerereşî û têkşikandina kirameta mirov e
kirine armanc, û nemana rejîmê dixwaştin, û “ne” gotne rejîmê, û yekdeng dane zanîn ku rejîm dibe ji
nav here.

Bi gîştî rewşek ku niha mirovên nava cugrafîyaya Îranê ezmûn dikin, pêk tê ji rewşeke xirab ku mirov
ji wateya jiyanê betal bûne, ku hekî bixwazin ew rewşa xirab berdewam nebe, tenê yek rê zêdetir nîne
ku ew jî guherîna rejîmê ye.

Civatgeh dibe hemû ew aştengiyên ku xwe li nav hundir û rûçikê kultûr û civatgehê de diyar in yan
veşartî ne binasin û bîr ji wan bikeû, û bo pêkanîna guherînê li ser wan de bifire.

Yekem pêngav jî bo rizgariyê eva ye ku li hizra civatgehê de rejîm bête herifîn. Eva jî nayê guncandin,
meger li dervey wê dab û nerît û şeweya hizirkirinê, em bîr ji paşerojê bikin.

Sergotar

Herifîna Îranê

N: Kerîm Perwîzî

Zêdetir ji 4 dehikan e ku deshîlata koloniyalîstî ya hakim li Tehranê, ne tenê xwîna netewên zulmlêkirî, rijandiye ser rê û kolanan, belku hinde zulm û serkut derheqê wan de kiriye, ku heta gulbûlên xwîna wan hesin tê de nemaye, û xwîna wan zer bûye, belkî netewa Fars jî ku her ji despêkê ve ji poan û rantên hikûmetî mifah werdigirtin, niha heştîyên wan jî êdî di bin çerxa dezgeha deshîlata dîrîyê de dişkê, û hûr-hûr dibe.

Ya ku bi hatina serkar ya Komara Îslamî bi tenê hate serê netewên Kurd û Turke-men, piştî şoreşa gelan li Îranê tenê ew du netewe raştî kuştin û karesatê hatin, li berdewamiya 4 dehikan, niha êdî pêşîra navenda Îran û bajarên Farsnişîn jî girtiye. Di meha Xezelwera sala derbasbûyî de, mînakê ji dirindeyiya rejîma koloniyalîstî ya deshîlata, berbirûyê xelkê Fars jî hate kirin, û kuştarek li neteweya Fars hate kirin, û digel netewên din ew jî hatine qetilkirin, wê demê wan jî zanîn ku tama qetilkirina li ser şeqaman bi çi wateyekê ye?

Di wan 4 dehikan de, gelek caran bas ji guherîna rejîmê û afirandina alternativekê bo wê rejîmê hatiye kirin û di dervey welat de, çalakvanên siyasî yên girêdayê netewa serdest, xwe ji tev raştiyan dûr kirine, û amade nînin ku raştiya civaka çendnetewî ya Îranê qebûl bikin û heta di nav wan de hebûn ku digotin hekî bigehe cihekê de berevaniyê ji komara Îslamî bikin, da ku netewên din (bi gotina wan: cudahîxawazan) negihîjin armancên xwe. Aştengiya serekî li ser rêya

Peyama PDKÎ bi hilkefta koça dawî ya Dr. “Fîrset Sofî”



Dezgeha Pêwendiyên Giştî ya PDKÎ bi hilkefta koça dawî ya Dr. “Fîrset Sofî” peyama hevxiyê bo Serokatîya Encumena Wezîran a Hikûmeta Herêma Kurdistanê şand.

Deqa peyamê wiha ye:

Rêzdar Serokatîya Encumena Wezîran ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê

Silav û rêz

Bi dax û kesereke zêde ve nûçeya koça dawî ya Parêzgarê Hewlêrê Dr. “Fîrset Sofî Elî” bi sedema nexweşiyê gihîştê me û bû sedema xemdariya me hemûyan.

Bi hilkefta wê nûçeya nexweş, em sersaxiyê dibêjine we rêzdarên û

Serkirdayetiya PDK û Encumena Parêzgeha Hewlêr û malbata welatpewer ya wî xortê dilsoz ê gelê me.

Dr. “Fîrset Sofî” kesayetiyeke akademîk û siyasî bû û di heyama kar û têkoşîn û xizmet bi armancên gelê Kurd di warê zanîstî de yek ji mamostayê payebilind yê Kurdistanê bû û hevdem di warê yasadanîn û beşdarî di proseya birêveberiya Herêma Kurdistanê de yek ji kesayetiye naskirî û bi şîyan yê parlemana Herêma Kurdistanê bû û di dawî erkê îdarî û xizmetguzariyê de jî, yek ji kesayetiye xemxwer ê gelê me bû.

Koça dawî ya wî xortê bi şîyan û bi wec yê gelê me, bo PDK û proseya siyasî ya Herêma Kurdistanê xisarekî mezin bû.

PDKÎ carek din hevderdiya xwe pêşkêşê malbata wî ya rêzdar û tev dost û hevalên Partî û Hikûmetî dike û sersaxiyê dibêje wan.

Silav li rihê paqij ê “Fîrset Sofî Elî”

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
Dezgeha Pêwendiyên Giştî
Mihemednezîf Qadirî
28ê Xezelwer a 1399an a Rojî
18ê Çirriya Paşîn a 2020an

peydabûna alternatifê bona paşeroja Îranê, ew part û aliyên siyasî bûn ku xwe bi xwediyê seranserê Îranê dizanin û biçûktirîn maf bo netewên din bi rewa nedizanîn, lê niha ku Îran bi tewawî ber bi kavihbûnê ve diçe, sameke mezin ketiye dilê wan.

Ew bo vê ku nebe netewên din bigihînin mafên xwe, ew amade bûn ku rejîm di deshîlatê de be; Niha êdî baş dizanin ku berdewamiya rejîmê, kavilkari û qetilkirinên zêdetir lê ketiye, û bi nêzîkbûna Xamineyî digel Çînê, Îran ber bi bûn bi “Somaliyeke din”ê ve diçe! Niha ew hêzên siyasî ku xwe bi xwediyê tewawê Îranê dizanin, wêneyeke herî metirsîdar ber çavê wan e: “Herifîna Îran”ê! Bi herifandina deshîlata Komara Îslamî razî nebûn û zehlê wan li paşerojeke demokratîk û federal bo tev netewên din li Îranê diçû, lê berdewamiya Komara Îslamî û Korona û krîza aborî û nêzîkbûn bi Çîn, herifîn ne tenê siyasî, belkî aborî, civakî û çandî; ew wêneya wehmî li ber çavên wan hêzên ku li dervey welat in, aloz kiriye.

Berdewamiya “perakende”bûna opozîsyonê, û nepejirandina mafên netewên din, berdewamiya deshîlata koloniyalîstî ya Tehranê li pey xwe tîne, ku Îranê ber bi qonaxa hirifîn û şikeştineke dîrokî ve dibe; “Somaliyek” din ji dilê Tehranê ve serî hildide.

Maka terorîzma cîhanî



N: Nûredîn Sofîzade

Berî vê ku em basa hindê bikin ku maka terorê di cîhanê de kê û çi aliyek û welatek e, divê em ji wê cîhana pan û berfireh û bi taybetî ji wan welat û aliyên ku basê şerê dijî terorê dîkin, bipirsîn ku erê gelo bi rastî heya niha hûn nizanin û tenegehîştine ku çavkanî û maka terorîzmê kê û çi aliyek e?

Erê gelo ewa çi tiştek e ku ber çavê we digre ku hûn raştiyan nebînin?

Erê gelo çi berjewendiyek pêşya zimanê we digre ku heqîqetê nabêjin? Û gelek pirsyarên dinê....

Her wekî hemî aliyek dizane rejîma Îslamî ya Îranê, her di dema hatina ser karê xwe de heya niha, gorî dirûşmekê ku hilgirtiye, armanca sereke ya wê, hinartina şoreşa Îslamî ye bo hemî cîhanê.

Wê rejîmê bi armanca berfirehtirkirina îdolojî û hejmoniya xwe, bona çêkirina împatoriyeke Îslamî di cîhanê de ku ew rêberî bike, ti sînora neparastî û rê bi xwe daye ku di her welatekê de ku di her kîdera wê cîhanê be destêverdanê bike.

Rejîma Îranê bona gihîştina bi wê xevn û armanca xwe jî, çi ji desta hatibe kiriye, bo mînak girûpên tundajo di zaf welatan de çêkirine ku bi çek û perê xwe ew teyar kirine. Di piraniya welatên devera Rojhilata Navîn de, weke Erebiştan, Behrêyn, Yemen, Lubnan, Filîştîn, Efxaniştan, Pakîstan, hin ji Komarên Rûsiyê, Îraq, Sûriye û zaf welatên dinê de, girûp û milîs û taqmen cor bi cor ên girê-

dayê xwe çêkirine û pirçek kirine, bi perê xelkê Îranê wan îdare dike, û her dema bixwaze bo her armanckê wan girûpane bikar tîne. Rejîma Îslamî ya Îranê bona birêveberî û sergêrîkirin û kontirola wan girûpane jî, taya Spaha Quds a Spaha terorîst a Paştaran çêkir ku kar û me'îmûriyeta wê taya Spahê, bo derveyê welat e, an ku tenê bona sergêriya wan girûpên girêdayê rejîmê li welatên cor bi cor de ye.

Rejîmê bi bikaranîna wan girûpan, her dema xwaştibe di her kîdera cîhanê de teqîn kirine, bo mînak teqîna navenda fermandehiya hêzên Amarîka li Erebiştanê, teqîna navenda hêzên Amerîka li Lubnanê, teqîna navenda Cihûyan li Arjantînê, teqîna Beyrûtê ku bû sedemê terora Refîq Herîrî û gelek teqînên dinê ku piştî vekolînê xuya bûye ku biryarderê sereke rejîma Îranê bûye.

Rejîmê ji rêka wan girûpên milîs ku di zaf cihan de çêkirine, her dema xwaştibe alozî û nerizayeti li dijî deshilat û hikûmetên welatan lidar xiştiye.

Rejîma Îranê tîmên taybetî di nava wan girûpan de perwerde kirine ku bona terora kesayetiyên siyasî yên welatan bi kar tîne, bi taybetî bona terora rêber û kesayetiyên siyasî yên dijberê xwe li derveyê welat bi kar anîne, bo mînak terorîstên ku Dr. Sadiq Şerefkendî Sekreterê PDKÎ û hevalên wî şehîd kirin, ji 6 terorîstan 5 ji wan Lubnanî û Feleştînî bûn, terora Şapûr Bextiyar her xeyrî Îranî bûn û gelek mînakên dinê jî hene. Rejîma Îranê di welatên Amerîkaya Latîn û Ewropayê de dehan û sedan kiryarên terorîstî encam dane û hemî ew welat jî gelek bi başî wê raştiyê dizanin, her niha çendîn tîm û kesên terorîstî yên ser bi rejîma Îranê di zaf welatan de hatine girtin û hikimdan.

Deshilatdarên rejîmê berde-wam cehd kirine ku alozî



û şer û malvêranîyê bêxine nava welatên deverê ku hemî dewlet û saziyên navnetewî wê yekê baş dizanin.

Niha hinek belge hatine eşkerekirin ku rejîma Îranê deşt di bûyera 11ê Sêptembra 2001an de hebûye.

Rejîma Îranê deşt di çêkirin û bikaranîna girûpa terorîstî ya DAÎŞê de hebû ku bona paraştina Beşar Esed û derbelêdan ji Kurdistanê û vêrankirin û jinavbirina deverên Sunniyan di Îraqê de bi kar anî.

Rejîma Îranê piştevan û teyarker û biryarderê sereke yê girûpa terorîstî ya El Qa'îdê ye û piştî êrîşa Amerîka bo ser Efxaniştanê, rêber û deshilatdarên wê girûpê berdewam di Îranê de hatine xwedîkirin. Kurê Bin Ladên di Îranê de bû. Tête

gotin "Eymen El Zewahirî" di Îranê de bû heya ku her li wir jî miriye, Misrî kesê duyem yê "El Qa'îd"ê heyamekê berî niha di tehranê de ji aliye Îsraîlê ve hate kuştin.

Belê hemî cîhana ku îdia dike şerê terorîzmê dike, bê guman ew xalên serê hemî bi belge deşt wan de hene û sedan belgên dinê li ser kar û kiryarên terorîstiya rejîma Îranê hene ku bikarin carekê bo hertim bi yekdengî bibêjin ku mak û piştevan û perwerdeker û teyarkerê terorîzma cîhanî kê ye.

Îca hekî wisa ye ne kum bi-dine serê xwe û ne xelkê dinê pê bixapînin.

Ew bê helwêstiya tenê tiştekê bo qurbanîyên terorîzma Îranê dide kîvêşê, ku wan jî berjewendî di hebûna maka terorîzmê de hene.



Zinîdkirina rêkvevtina “BERCAM”ê jî bi hewara rejîmê nayê!



N: Dara Natiq

Weke tê diyarîkirin ku berpirs û rayedarên dewleta Îranê bi nemana Tramp weke Serkomarê Amerîkayê dilxweş in û wan wisa dizanin ku êdî Serkomarê nû yê Amerîkayê dê bi hewara wan de were û rejîmê li herifînê rizgar bike û moralek bide wan. Lê di rastî de dewleta nû a Amerîkayê, dema bixwaze wegere bo ser rêkvevtina di serdemê “Obama” a bi navê “BERCAM”ê jî, yê dorpêç û ambargoyên ser Îranê jî her weke berê berde-wam bin tu guherînek bo baştirbûn rewşa aboriya aloz û şikesrxwarî a Îranê pêk nahê.

Her weke hemî aliyek haydar û dizanin ku piştî çend salan gotûbêjên di navbera Îranê û civatgeha navdewletî di sala 2015'an de, piştî 18 roj gotûbêjên berfireh û berde-wam, di encam de karîn bigin rêkvevtineke dîrokî derbarê bi dawîanîna programa etomî ya Îranê de, li beramber rakirina dorpêçên ser wî wilatî û azadkirina bi milyon dolar ji pereyê bilokkirî yê Îranê di bankên biyanî de.

Vê rêkvevtinê hêvî bo sektora bazirganî û aborî ya Îranê vegerand û dewleta Rûhanî jî ew yek weke serkevtinek mezin bo avedankirina Îranê û kilîda rizgariya welat bi nav kir. Lê dema “Donald Trump” wek 45'emîn Serokê Amerîkayê sonda yasayî xwar di deştêpêka Serkomriya xwe a li sala 2018'an de, “Trump” daxuyaniya xwe ya çaverêkirî belav kir.

Serokê nû yê Amerîkayê “Donald Trump” anî ziman ku: “Di demeke kurt de, dewleta serkirdeyê cîhanê bo terorê digihe keviya bi

deştixistina metirsîdartirîn çek di cîhanê de û ew rêkvevtina dema Serkomariya “OBAMA” bi Îranê re hatî wajokirin yek ji xirabtirîn rêkvevtinan bûye ku tenê bi qazancê dewleta terorîst a Îranê hatiye pejrandin û wajokirin. Lewra, ez îro radighînim ku Amerîka ji rêkvevtina etomî ya Îranê vedikişê. Di çend xûlekên kêr de, yadaştnameyeke Serokatîyê wajo dikim ji

hatine deştîşankirin ku yê werne dorpêçkirin û sizadan. Ger “Bayden” jî wek serko arê Amrîkayê wegere bo rêkvevtina Bercamê, ti cudahiyeke bo Îranê nabe meger tev dorpêçên ser Îranê bihên rakirin ku ew jî ne karek hêsane.

Paştî ku “Donald Truamp” rêkvevtina nûkirî a ku li Îranê jêra dibêjin (BERCAM) hilweşand û ji nû ve lidar


yan re, êdî rûxana yekcarî ya aboriya Îranê xistiye rojevê. Ev pirsgerêka di hêla aborî de bandor li ser hemû aliyên jiyana xelkê daniye û êdê jiyana wan pir zehmet bûye û bêkarî, buhatî û nebûna îmkânên jiyane bûne sedemê bêkarmayî û birçîbûna bi milyon xelkê Îranê. Guman nîne ku penguhirîna wan hemû qeyran û pirsgerêkên dê li pêşerojê de bibe sedemê ji kontrolderketina îdarekirina civakê û ber bi teqîna yekcarkî û serhildana seranserî ya xelkê Îranê bo rûxandina vê rejîmê û rizgarbûn ji wan hemû arîşeyên jiyane.

Bê şik weke hemî aliyek bi başî dizanin ku siyaseta îstîratêjiya Amrîkayê derheq Rojhilata Navîn û nemaze Îranê, bi hûrî û ji aliyê navendên lêkolîn û komîteyên taybet û li gor berjewendiyên wî welatî tê organîzekirin û darêtin.

Siyaseta xuya û diyar a Amerîkayê ev e ku nabe rejîma Îranê bibe xwediyê çekên etomî û weke dewletek terorîst û saportkerê girûpên teroîst dibe deştê wê di fitne û alozî û têkdanên herêmî û welatên cîran de were kurtkirin.

Îca her kesek bibe Serkomarê Amrîkayê wê siyaseta han derheq Îranê weke xwe û lê bi taktîk û rêyên cuda bimeşîne. Lê ya diyar e ku “Baydin” dixwaze berevaji “Turamp” civatgeha navdewletî jî bi Amrîkayê re bi dijî Îranê hevdeng bike û bi dostên xwe yê Ewropayî re pêk were û hevdengiyek zêdetir a cîhanî bi dijî Îranê çê bike.

Ew dorpêç û ambargorên derbasbûyî bo ser Îranê ne tenê weke xwe yê bîminin, belkî wê carê Koşka Sipî û Serkomarê nû bi yekdengiyek cîhanî yê zext û gifaşên bo ser Îranê bi merema naçarkirina wan bi rêkvevtin û pabendbûn bi yasa û rêsayên cîhanî re tundtir û xurtir bike.



bo ektîvîkirin û dorpêç û ambargoyên nû û bi bandor yê Amerîkayê bo ser rejîma Îranê.”

Herçiqas Çîn û Yekîtiya Ewropayê di nav rêkvevtinê de man, lê bi derketina Amerîkayê ti bandoreke wê ya zêde nema. Her di deştêpêka sala 2018'an de gera yekem a dorpêçên Amerîkayê bo ser Îranê deşt pêkir. Di heyamê dewleta Tiramp de zêdeyî 60 dorpêçên berfireh yê aborî weke siza bo ser Îranê hatin sepandin ku piraniya wan biryaran nû û bi bandor bûn. Yek ji biryarên nû sepandina dorpêçan bi ser binkên sereke yê aboriya Îranê ye ku aliyê kêr pênç biryarên din yê giran jî hene û herwisan 55 kesatî û sazîyên nû ji aliyê Amrîkayê ve

xistina dorpêç û ambar-goyên aborî li dijî Îranê û hewldanên ji bo pêşîgirtin û qutkirina deştê Îranê li tevliheviyên li Sûrîyê, Îraq û Rojhilata Navîn, êdî ev rejîm li asta herêmî û navdewletî de jî bi tewahî kete perawêzê û meşrûiyeta xwe ya navdewletî jî ji deşt da. Bandora wan dorpêç û helwestên Amerîka li dijî Îranê, ji hêla aborî ve bûye sedemê bê qîmetbûna buhayê diravê Îranê û giranbûna sedî sed ya nirxa pêwîstiyên jiyane bi giştî û xasmanî erzaqê xwarinê, bê îtbarbûna sîstema bankî û ji karrawestana piraniya fabrîkeyên navxweyî, ji kontrolderketina rewşa bazarê, vekişîna kompaniyên biyanî û helweşîna piraniya girêbestên ticarî û bazirganî bi wan kompani-

Xeta xwar di bin serê gayê pîr de



N: Elî Munezemî

Hindê dem derbas dibe, xelk li bin siya deşhilatdariya rejîma kevneşop û terorîst-perwer a Îslamî ya Îranê de rojên reştir li roja berê dibînin û jiyana wan bi yek-carî tehl û reş bûye. Ew xelkê belengaz û çarereş bi rastî li deştê wê rêjîma terorîst û dije merivî de hatine emanê û her rojê şahidê derketina kêşe û arîşeyekê ne. Sedema wan hemû arîşe, nehmetî û diywariyan tenê yek tişt e: Hikûmetdariya rejîma gendel û fasid a Îslamî a Xumeynîstî a Îranê. Gava di civakekê de sîstem gendel be, çareseriyek xêncî xwe xilaskirin ji deştê wê nîne. Ma ne wisa ye ku gava didanek xirab be, meriv dibe wî didanî bikşîne û bavêje!?

Gava ku tê gotin “ew rejîma gendel û mafiyayî ye”, ew gotina “ne ji kîsê beroj e”. Heger û belge wê rastîyê didin eyankirin û piştraşt dikin. Gendelî ku serçaveya lawazkirin û binaxkirina saziyên demokratîk, paşvehêlana geşekirina aborî û serhildana nearamiyê û jihevbelavbûna civakê ye, û dibe sedemê serhildana hejarî, krîzên jîngehî û nemana baveriyê hember sîstema siyasî. Lê ew yeka bo karbideştên hikûmeta dagîrker a Îranê nexem e. Ji ber ku ji xwe her li deştpeka hatina ser hikim heta îro, ne xelkê bawerî bi wê sîstema gendel û merivkuj hebûye û ne jî xelk û jiyana xelkê çî girîngiyek cem karbideştên wê rejîmê hebûye. Herdu alî ji hev bîhanî ne û “bikevin zikê hev, yê xwe bavêjin behrê”! Ji ber ku xelk bikare bi awayek jîrane û xurt di

hember sîstema gendel de bisekîne, berxwedanê bike û karbideştên wê rezil û risva bike, dibe li pêş de bizane ka ew sîstema çawa dixebite ku fersenda afirandina gendeliyê pêk tîne.

Sîstema cinayetkar a Îslamî ya Îranê bi wan sedeman gendel e:

-Makezagon serçaweya yasayîkirina ferq û cudayîdanîn (discrimination)ê ye.


-Sîstema deşhilatdariyê, totalîter û paşvero ye.

-Deşhilatdar li pile û deşhilata xwe bo dewlemendkirina xwe û xizim û kesûkarên xwe mifahê werdigrin.

-Bertîl emrazê wergirtina xizmetan û pêşvebirina şolê ye û hemû damûdezgeh, mehkeme, damûdezgehên ragehandin û ... di wergirtin û dana bertîlê de pişikdar in.

-Ew fesada ku li bin sîberê de diqewime, sîstema bankî û diravî û avokat û ... hwd bo spîkirina dirav pişikdar in û di rêyên cur bi cur de wê gendeliyê xwe wedişêrin. Di bin siya hikûmeta Xumeynîstî de, çî cihek nemaye ku gendelî tede neyê kirin. Di wan rojên derbasbûyî de ku bas ji hilkişiyana nirxa pincar û fêkiyan dihate kirin, xelk bi êşkere vê yekê girêdidin bi wan şirketên heremî ve û dibêjin ku hindê kesan deşt danîne ser bazara fêkiyan û ji ber ku nirx neyê xwarê, hindê caran fêkiyên saxlem bi xwe ji nav dibin ku nekevin bazarê û nirxa wan neyê xwarê. Ji aliyek din ve jî, delal hene ku fêkiyan bi nirxek erzan ji cotyaran dîkrin û heta wan fêkiyan didin bazarê ku bikeve ber deştê xelkê, nirxa wan 3-4 beramberê wê nirxê ye ku li ser zewiyê li cotyaran kirîne.

Xelk li ser wê baweriyê ye ku ne tenê karbideştên hikûmeta gendel cehd nakin bo çareseriyê pîrsgirêkên xelkê û çî pilanek bo wê hindê nînin, bi xwe jî serçaveya afirandina zehmetiyan




e bo xelkê. Dewleta axûndî ne tenê deştê xelkê re nagire, belkî ew “yarane”ya (yar-metiyê) ku dida cotyaran bo kirîna “fertilizer” (kûd) jî li ser cotyaran de daye qutkirin. Ji ber ku rejîm seba embargoyan di rewşeke aboriya xirab de ye û pere ne bo kirîna pêdaviştîyên cotkaran, lê bo girûpên terorîstî û meyandina uraniyomê û gihîştin bi çekirîna çekên etomî bikar tîne. Niha di encama wan siyasetên şaş yê rejîmê de, bilindbûna nirxa dolar û zêdebûna gendeliyê, xelk roj bi roj hejartir û feqîrtir dibin û şiyana kirîna fêkiyan ku çavkaniya sereke ya vîtamînan e bo xwe û zarokên xwe nînin. Niha wisa lê hatiye ku xelkên hejar, fêkiyan ne bi kilo, lê bi dene dîkrin. Hindê ji wan jî yan fêkiyên deştê dû (yên kevin ku xelkê zengîn nexwarinî paşve zivirandinî bo dikandaran) dîkrin yan jî li dawîya şevê de diçin bo kirîna fêkiyên bêvec û bermayî.

Ew yeka nîşan dide ku rejîma nesax, bûye sedemê belengazî û çarereşiya xelkê.

Ew çarereşiya li hemûyan zêdetir para xelkê kurd e li Rojhelatê Kurdistanê ku ax û av û welatê wan bi hemû zengîniya xwe ya sererd û binerd ji aliyê Îraniyan ve hatiye dagîrkirin. Bo vê ku ew xelkane bikaribin xwe ji wê çarenivîsa reş derbas bikin, tenê yek rê heye û ew jî rizgarkirina Kurdistanê ye. Di pêxema rizgariyê de cehd û xebat û piştgirî li xebatkaran pêdivîye. Ji ber ku li kêleka azadiyên takekesî, azadiya erênî jî pêdivî ye û em dibe bizanin ka kê/kî dibe li ser me hikim bike û li çarçoveya wê sîstema ku em tede dijîn, em dikarin çî bikin yan çî nekin. Em dibe wê rastîyê fam bikin ku jiyan di bindestiyê de ne layiqê me ye û ne jî em di bin deşhilatdariya dagîrkeran de dikarin keramet û jiyanek merivane bi deşt ve bînin. Ew ne çî jiyan e ku meriv nekaribe hind deştvekirî be ku aliyê kêmkaribe hewceyiyên xwe yê rojane asûde bi deşt ve bîne. Bes em hemû bi hev re bo azadiyê bixebitin bibin rêvîngê rêya azadiya welatê xwe.



Geşeya çandî di bin siya belavokan de



N: Bêhzad Qadirî

W: Bêhzad Simko

Yek ji wan mijarên girîng ku hewce ye di civakê de zêde bala xwe bidnê, geşeya çandî ye.

Wate û mijara “geşe” ji şerê cihanê yê duyem heta îro, guherîneke zaf bi xwe ve di-tiye; Hizir û mijarên despêkî li çandê, pêwendî bi aborî ve hebûye û pîverên aborî wekî: “Rêjeya berhemanîna nepaqîjiya netewî, bikaranîna vîze û pola û...hwd” pênaseyek bûn bo aştî geşe û pêşketin an paremana welatekî; Lê ji dehikên 70an ya sedsala 20an a Zayînî ve, pîverên civakî an parvekirina dadperweraneya darayî, despêregihîştin bi emrazên giştî wekî aramiya siyasî û bûdceya perwerdê û lêkolînan, hin sedem bûn ku hêdî-hêdî wekî pîverên “geşe” hatine nasandin.

Îro civakek pêşketî ye ku bikare li tenişt pîverên aborî, li ser pîverên perwerde û zaniyariyan û di raştîyê de ji binyata “zaniyariya civakî” tekeziyê bike; Herwisa di civakekî wiha de, mediya û nemaze belavok, bi berhemanîna û belavkirina zaniyariyên biwec, rolekî erênî û zêde di zêdekirina aştî zaniyariyên girîng û cur bi cur li xwe bigre, û di beşên cuda de alîkarê pêşketina civakê be.

Hekî pirsgrîk û aştengên civakê bi başî bêne naskirin û seh bi girîngî û hewcehî bi teknolojiyê di çareserkirina pirsgrîkan de bikin, dikarin kêmasiyên hizrî, aliyên şaş û lemperên çandî yên heyî, bi civakê bidin nasandin; Lê di wê navberê de, ragihandin û belavok rolên pir girîng hene

ku geşeya aramiya civakê li stûyê wan e û wekî hêzeke hander bona têgihîştin û geşeya çandî ya civakî rola karlêker dilîzin.

Geşe bona mifahwergirtin ji xizmetguzariyên madî û seha hundirî, hewcehî bi “perwerdekin, zanyarîpêdan û amadekirina hizra giştî heye”. Di wê navberê de rola ragihandinan bi taybet belavokan, wekî yek ji parametrên girîngên “geşeya çandî” derdikeve û tê dîtîn û

Belavok bi nîrxê û erzantirîn emrazan in bona bilindkirina aştî agehî û zaniyariyên takên civatgehê. Bo qebûlkirina wê gotarê ku geşeya piroseyeke çend alî ye û geşeya aborî di wê navberê de berçavtir e, lêkolîn vê yekê didine zanîn ku geşeya aborî hewcehî bi geşeya çandî heye.

Serdemek ku “rojname” wekî yekemîn emrazê pêwendiya giştî ji dayîk bûye, internet, satelayt û ragihandin her



di civakê de bi kiryarên xwe yên wekî “gihandina zaniyariyan û perwerdê û...hwd, ji rêyên cuda ve alîkariyê bi geşeya civakî didin.

Geşeya çandî wekî yek ji rîşeyên geşeya netewî, dibe bikare rêyên seraşt yên hewce û binyatên heyî wekî potansiyela çandî ya civakê peyda bike û mifahê jê verbigre. Di vê derheqê de geşeya çandî dibe di warên “bideştanîna geşeya resenîyan û herwisa dahênanan” alîkariya civatgehê bike; Ji alkiyek din ve bi amadebûna hemû endamên civatgehê ji afirandina çandê seraşt û bihêzkirin û berfirehkirina rikeberîyeke quncaw”, rêya berfirehkirina çandê avale bête.

pêşketî, bê mifahwergirtin ji ragihandin û emrazên din yên pêwendiyên giştî, nemumkin e; Çimkî geşe proseyeke çend alî û zindî ye ku bi derbasbûna dem, alî û stratejî, têne guherîn û dibe bi berdewam digel guherînên civakê û hewcehiyên wê, hevaheng bin.

Li hin ji civakan bi awayê agahane ji ragihandin û belavokan mifahê werdigrin û roj bi roj rewşa çandîya xwe û rewşa geşeya civaka xwe baştir dîkin; Li hin ji civakên dinê de jî bi awayekî neagahane ji ragihandin û belavokan mifah werdigrin ku di wan sisteman de, hegera vê yekê heye karlêkeriya ragihandin û belavokan di civakê de bibe sedema pêkhatina çandê neguncaw, wekî “girîngîdan bi karên tekekesî bi cihê karên bi kom, hawirdekirin bi cihê hinardekirin, hawirdiyên neguncawa civak û bihayên biyanî û...hwd”, ku ew mijarane dibine sedema lawazbûn û paremana gel û civakê.

Ya rohn û eşekere ye eva ye ku dibe wê serdemê de pêka dariştina bername û hizreke bi kom, tev gefan bikin bi derfet bo geşe û pêşketinê; Di wê navberê de dibe hêza karlêker ya huner, ragihandin û belavok wekî bandordartirîn û girîngtirîn awayên balkêşandina xelkê bona geşeya çend alî ya welat û netewa xwe, mifah jê werbigrin da ku em şahidê paşerojeke rohn û pir ji hêvî li ser binyata bihêz ya hizrî-çandî bin.



Nerîna Lîderan



“Emmanuel Macron”:
“Bernameya navîkî ya Îranê
gihîştîye asteke metirsîdar”.



“Elliott Abrams”:
“Rejîma Îranê bingeha nearamiyê
li Rojhilata Navîn û cîhanê ye”.



“Bulent Arinç”:
“Dibe Demîrtaş bê berdane”.



“Husên Dêhqa”:
“Teqîna damezraya navîkî ya Ne-
tenzê “xirabkariyek pîşeyî” bû”.

Êdî Spaha Pasdaran behsa wan mûşekan dike ku parzemînan derbas dîkin



N: Eskender Ceiferî

Di salên derbasbûyî de her-
tim Emîrelî Hacîzade fer-
mandarê hêzên esmanî yên
rêxistîna têrorîstî ya Sipaha
Pasdaran behsa wan balafirên
biçûk dîkir ku ji bo hêsan-
karî û çavdêriya êrîşê bi kar
tên. Wî herwisa behsa hertim
pêşketina rejîma Tehranê di
pêşesaziya mûşekan de jî
dîkir.

Piştî ku rejîmê, li balafira
Okraynê da û kesên tê de
hatin kuştin, berpîrsên re-
jîmê hewl didin bersiva wan
pirsyanan nedin ku girêdayî
vê mijarê ne.

Lê vê carê Emîrelî Hacîzade
di civîneke Sipahê de beşdar
nebibû û Mecîd Mûsewî
cîgirê wî ragihand ku Îran di
warê mûşekên dûrhavêj de
jî wek mûşekên din bi pêş
ketiye.

Dema ku têlêvîzyona fermî
ya rejîmê gotinên wî belav
kirin, ji xeynî gotinên wî
derbarê mûşekên dûrhavêj,
behsa wan mûşekan jî hate
kirin ku parzemînan derbas
dîkin.

Lê belê hîn ne xuya ye ku
rejîma Tehranê, çima behsa
mûşekên pêşketî dike di de-
mekê de ku bixwe di nav xwe
de û jî hêla xelkê ve û herwi-
sa ji aliyê civaka navdewletî
ve jî rastî givaşan tê.

Bê guman rejîma meleyên
Tehranê ji deştpêka hatina
xwe ve behsa kontroolkirina
cîhanê bi nûneratiya Xwedê
dike. Ew dixwazin deş-
tpêkê bi avakirina Hîlala Şîe,
welatên Şîe bigirin û pişt re
jî li welatên din ên derdorê,
deşthilata xwe berfireh bikin.

Beîrya niha rejîma Îranê
Setelaytek bi navê Sîmurx
nîşanî cîhaniyan da û ragi-



hand ku ew dixwazin wê di
pêşerojê de bi kar bînin. Lê
ji ber ku hem mezin bû û
rejîmê nedikarî bi hêsanî, wê
veguhêze, û hem jî ji ber ku
şiyana wergirtina wîzeyê bi
awayekî lezgîn tîne bû, rejîm
nikare wê ji bo karûbarên şer
bi kar bîne.

Tiştê ku xuya ye, ev e ku
rejîmê bi serkirdatiya Si-
paha Pasdaran dixwaze bi
pêşxistina bernameya xwe
ya mûşekan û herwisa ger-
nasîyê, wan mûşekan jî bi
pêş bixîne ku parzemînan
derbas dîkin. Eger rejîm
bikare heya asteke bilind di
warê mûşekên pêşketî yên
parzemînan de pêş bikeve,
wê demê bê guman dikare
wan mûşekan ji bo armancên
xwe yên şer jî bi kar bîne û
deşthilata xwe li ser navçeyê
ferz bike.

Bingeha wê bernameyê ji ali-
yê Husên Tehranîmuqedem
ve hatiye danîn û bi awayekî
veşartî û hevdem ligel kar
û çalakîyên pêşesaziya
mûşekan li Îranê, ew jî karên
xwe berdewam dike. Gelek
nîşan û sedem hene ku nîşan
didin ku ev bername, hew-
leke veşartî ye ji bo ku re-
jîm bikare di warê mûşekên
parzemînan de jî pêş bikeve
lê belê di asta navdewletî de
wan kar û çalakîyan, wek
pêşesaziya mûşekan û gerna-
sîyê bi nav bike.

karnasên warê çekdariyê
dibêjin eger Îran heya asta
pêwîst di vî warê de pêş
bikeve, em nikarin bêjin
ku çekên etomî berhem
anîne. Lê belê çekirina wan
mûşekan, berhemana çekên
etomî û bikaranîna wan jî
hêsanîr dike.

Sala 2011an teqîneke mezin
li navenda etomî ya Bîd-
genê çê bû û di encamê de

jî Husên Tehranîmuqedem
hate kuştin. Heya niha jî
nayê zanîn gelo ev teqîn ji
ber şaştîyên karmendan çê
bûne yan jî bi deşterdana
aliyên dervey Îranê hatiye
pêkanîn. Tiştê ku xuya ye, ev
e ku tevî mirina wî jî, Îranê
çalakiyên xwe yên di vî
derbarê de berdewam kirin
û sala 2020an jî behsa hin
çalakiyan kir ku heya berî
wê, nehatibûn eşkerekirin.
Herwisa Sipaha têrorîstî ya
Pasdaran, ragihand ku wan
matoreke avêtina setelay-
tan berhem anîye ku ji bo
pêşxistina pêşesaziya gernasî
û mûşekan li Îranê, bi bandor
e.

Ew gotinên Emîrelî Hacîzade
jî nîşan didin ku eger rejîma
Tehranê nekare ji bo birina
mûşekên parzemînan, ji wan
matoran mifahê bistîne, lê
belê dikare ji bo pêşxistina
wan, li ser pirojeyên berê
kar bike û hewlên xwe ji bo
berhemanîna mûşekên par-
zemînan berdewam bike.
Dema ku rejîm bixwe behsa
vê pêşketinê dike, hem dikare
ji aliyekê ve aliyên navdel-
wetî bitirsîne û ji bo rêkeft-
ineke din a etomî, baceke
mezintir ji civaka navdewletî
bistîne û hem jî êdî piştê wan
rast e ku ew li berhemanîna
bombeya etomî jî nêzîk bûne
û hem di warê pêşesaziya
mûşekên parzemînan de baş
pêş ketine. Ji ber ku wek kar-
nas dibêjin, ew mûşek, tenê
dikarin ji bo bombeya etomî
bêne bikaranîn.

Ji hêla din ve Îran,
alîkariya Kûriya Bakûr di
warê etomî de bi kar tîne ku
wêlêkî pêşketî ye di vî warê
de. Ew bi van alîkariyan,
hem dikare zûtir bombeya
etomî berhem bîne û hem
jî matora şandina avêtina
bombeyên etomî berhem bîne
ku mûşekên parzemînan in.

Hewldanên vajîkirina pirsê Kurd



N: Ebdulazîz Qasim

Hewldanên rejîma Sûriyê her ji deştê pîka damezrandina dewleta Sûriyê ve û heta îro ji bo vajîkirina dîroka gelê kurd berdewam in, bi taybetî piştî salên 60'î yê sedsalîya borî, ku gelê Kurd heta di pertûkên xwendinê de wekî revend û koçber dihat nasîn, piştî deştîşankirina Bişar Esed wekî serkomarê Sûriyê li şûna bavê wî di roja 17'ê Tîrmeha 2000'an de, ji aliyê wî ve hin soz ji bo guhertin û çaksaziyê hatin dan û qonaxekî bi navê "Behara Dîmeşqê" bi damezrandina çend rêkxistin û korbendên rewşenbîrî deşt pê kir, û heta salekî berdewam kir, ku di Reşmeha 2001'an de dergehên wan rêkxistinên civakî û rewşenbîrî ji aliyê dezgehên ewlekariya rejîmê ve hatine daxistin.

Rewşa deverê ber bi guhertinên demokratîk diçû nemaze piştî rizgarkirina Îraqê di behara 2003'an de û beşdariya nûnerên Herêma kurdiştanê di deştîlata demkî ya Îraqê de, vê yekê kartêkirin li nêrîna siyasî ya Kurdên Sûriyê kir, û hizrek peyda bû ku dibe heman ezmûn li Sûriyê jî dubare bibe, û di siberojê de Kurd bibin beşek ji hikumraniya Şamê. Di sala 2003'an de, PYD ji aliyê PKK'ê ve bi navekî ne kurdî hate damezrandin, wekî heman ezmûna damezrandina HDP li bakurê Kurdiştanê, û ji aliyê din ve di navbera hin partiyên kurdî û hin aliyên opozisyona Sûrî de têkilî û danûstandin hatin pêkanîn, rejîma Şamê ji aliyê xwe ve heşt bi metirsiya dubarebûna proseya Îraqê li Sûriyê kir û hewlên wê di plana peydakirina cudahî û nakokiyên di navbera Kurd

û Ereban de serkevtin bi deşt xistin, û ev yek bû yekem çirîska Serhildana Behara 2004'an ya navdar bi "Serhildana Qamişlo" di roja 12'ê Adara 2004'an de.

Di sala 2005'an de, "Cardana Dîmeşqê" ji aliyê hin partiyên Sûrî û çend partiyên kurdî ve hate ragihandin, û ji aliyê grûpa "Ixwan Mislimîn" hate pîrozkirin, ku ji aliyê hin partiyên kurdî ve ji ber nezelaliya daxuyaniyê li ser mafê gelê kurd hate redkirin, ku pirsê kurdî wekî pîrseke hemwelatîyan hatibû ziman, ne wekî pîrseke netewî ya xudan taybetmendiyên cuda. Piştî deştê pîka krîza Sûriyê di Adara 2011'an de, PYD li şûna mafên netewî hizreke dîr ji raştiyê bi navê "netewa demokrat" pêrew kir, lê tevî pêdagiriya pîraniya partiyên kurdî li ser pirsê netewî, mixabin nikarîn rêyeke cuda bipejînin, û zû tevî opozisyona sûrî bûn bîyê ku danasînê bi mafên gelê kurd bike, tevî ku îro opozisyon paşî bû kopiyê rejîmeke dagîrker û alavek di deştê Tirkîyê de ji bo bikaranîna siyaseta wê û dagîrkirina navçeyên kurdiştana Sûriyê û cêbicêkirina heman siyasatên berê yê rejîmê li dijî gelê kurd li Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê.

Îro, herdu dewletên kartêker li Sûriyê, Amerîka û Rûsiyayê serederiyê ligel pirsê kurdî wekî pîrseke netewî nakin, Amerîka dixwaze tevgera kurdî bi opozisyonê ve bête girêdan, û kurd bê hîç gerantîyek bibin beşek yê opozisyonê, û cext li ser beşdariya ENKS'ê di nav rêzên opozisyona alîgira Tirkîyê de dike, û Rûsya berevajî Amerîka dixwaze kurd bibin beşek ji rejîmê, hevdem ku hê çarenivîsa rejîmê bi xwe diyar nîne, tevî ku ne opozisyon û ne jî rejîm berhev nînin ku danasînê bi mafên netewî yê gelê kurd bikin.



Tirkîye di nav krîza Sûriyê de bi rolek herî metirsî li dijî gelê kurd radibe, û nêzîkbûna wê ji Rûsya û ji Amerîka bi heman nêzîkbûnê, meirîtiya wê li ser siberoja mîletê kurd zêdetir dike, ji ber vê yekê baweriya gelê kurd bi Amerîka û Rûsiyayê ya sist û lawaz e, lê kurdên xwelîser li hember Rûsya û Amerîka ti çare nînin, piştgiriya Fransa bi tenê tevî giringiya wê têra me kurdan nake, nemaze ku Fransa senga xwe ya navdewletî wekî caran nîne, û ji ber siyaseta Amerîka û NATO, ku Fransa li hember Tirkîyê li bakurê Afrîka û Sûriyê û heta di derya Spî de jî raştî ziyanên mezin hatiye, heta ku Fransa di krîza Qefqasiya de jî têkşikest û ti deştkeft bi deşt nexistin li hember serkeftina Rûsya û Tirkîyê li Qerebaxê.

Îro rewşa kurdiştana Sûriyê ji hemû aliyên siyasî û aborî û heta ya tendirustî ve ber bi trajediyek mezin diçe, û hêviyên kurdan yê girêdayî danûstandinên kurdî-kurdî sar dibin ji ber hin daxuyaniyên nîgetîv yê di çapemeniya kurdî de, tevî dirêjbûna heyamê danûstandinan ku kêmtir ji gavên reqê (kêso) ne, ku bi tenê li ser kaxezan dibe, û ti berhemê wan li ser erdê nîne, û ti encamên erênî yê girêbeşa kompaniya Amerîkayî ligel hêzên HSD ji bo berhembênan û firotina petrolê li ser jiyana xelkê Rojavayê Kurdiştanê nîne.

Helbet ku siyaseta Kurdî li hember rewşa tirajedîk di tengasiyeke mezin de ye, nemaze ku opozisyon û rejîm kodeng in li ser dijminatîya gelê kurd, û dixwazin pirsê kurdî ji naveroka kurdî bi rêya Tirkîyê û biryarên navdewletî vala bikin, ku heta radeyekî ji aliyê kurdan bi xwe ve jî pirsê kurdî ji naveroka netewî hatiye valakirin, ku pêdivîye kurd pêdagiriyê li ser naveroka pirsê kurdî wekî pîrseke netewî ya xwedan taybetmendiyên cuda bikin, nemaze ku dibe guhertin di siyasatên Amerîka de peyda bibin ku dibe rêveberiya nû ya Serok "Joe Biden" siyasetek nû hebe derbarê krîza Sûriyê bi giştî, ku nêzîk ji siyasat û hizra Fransî be.

Di 7 mehên derbasbûyî de 400 kedkar rastî bûyerên kar hatine

Bi sedema bûyera kar li parêzgeha Kirmaşanê, li 7 mehên îsal de, 392 kedkar li wê parêzgehê bûne qurbaniyên bûyera kar.

Birêveberê Pizîşkî yê Yas-ayiya parêzgeha Kirmaşanê ragihandiye, di 7 mehên îsal de, 23 kedkar li wê parêzgehê bi sedema bûyera kar canê xwe ji dest dane.

Selîm Xanî, bi beravirdkirina canjidesdana kedkaran pêka sala derbasbûyî ya 1398an a Rojî ragihand: “Sala derbasbûyî bi sedema bûyera kar 19 kedkaran canê xwe ji dest dabûn ku pêka îsal %4 zêde bûye.



Pêka gotina wî berpêrsê, di heyama wan 7 mehan de serhev 392 kedkar li parêzgeha Kirmaşanê tûsê bûyera kar hatine.

Bi sedema teqîna mînê welatîyek Serdeştî canê xwe ji dest da

Roja Sêşemî 27ê Xezelwerê welatîyekî Kurd yê bi navê “Ehmed Memendî” kurê “Hacî Ezîz” xelkê gundê “Deştê” yê ser bi bajarê Serdeştê ku bi sedema teqîna mînê bi dijarî birîndar bibû li nexwexaneya bajarê Urmîyê canê xwe ji dest da.

Pêka çavkaniyeke agehdar ew welatîyê Kurd bi sedema teqîna mînê her du piyên xwe ji dest dabûn û bi sedema xwînrêjiyeke zêde canê xwe ji dest da.

Herwisa wê çavkaniyê daye zanîn: “Ew welatî li dema

çêrîna terşên xwe nêzî binkeyeke leşkerî ya çûl li gundê “Paraştan” yê girêdayê beşa Wezîne ya ser bi bajarê Serdeştê rastî teqîna mînê hatibû.

Roja Duşemî 26ê Xezelwerê “Ehmed Memendî” bi sedema teqîna mînê bi dijarî birîndar bibû û bo çareserîya pizîşkî bo nexwexaneya Serdeştê hatibû veguhasîn, lê piştê bi sebema dijarbûna birînen wî bo navendên dermanî li bajarê Urmîyê hatibû veguhasîn.

We ewlatî xêzandar e û du zarok ji hene.



Spaha Pasdaran bi zanebûn madeyên hişber li Rojhilatê Kurdistanê belav dike

Li devera Mirgewer ya ser bi bajarê Urmîyê, Spaha Pasdaran a terorîst bi zanebûn ji aliyê kesên girêdayê wê Saziya terorîstî ve madeyên hişber di vê deverê de diçîne û sedan kes tûş wan madên hişber bûne.

Pêka çavkaniyeke agedar li devera Mirgewer a bajarê Urmîyê ku bi malpera “Kurdistanmedia”yê re ragihandiye: “Spaha Pasdaran hin kesên ser bi xwe yê bajarên din ên Îranê di dema çandiniyê de bo wan deverên Kurdistanê tîne û di nav



zeviyê wan ên çandiniyê de madên hişber ên wekî “Heşîş û Kirak” diçîne.

Herwisa wê çavkaniyê daye zanîn ku, Spaha Pasdaran a terorîst bi zanebûn wê karê qirêj dike ku ciwanên wê deverê tûsê wan madeyên hişber bike”.

Pêka gotina wê çavkaniyê, hejmareke zêde a ciwanên wê deverê tûsê madeyên hişber yê mîna “Heşîş û Kirak”ê bûne û heta nûciwanên ku temenê wan 12 salî ne jî tûş bûne.

Qanatê Kurdo û jiyana wî

Kurdên Yekîtiya Soviyeta berê ku hejmareke zêde bûn û li Ermenîstan û Gurcîstanê de dijiyan û hin îmkanat bo wan ji aliyê wan dewletan ve hatibûne dabînkirin, Kurdan jî ji wan îmkanatên heyî bo pêşvebirina ziman û çanda netewî mifahên baş wergirtin.

Di nav wan de gelek zana û nivîskarên bi navûdeng derketin, ku yek ji wan kurdnasê bi navûdeng Qanatê Kurdo bû. Ew yek ji wan kesan bû ku bingeha Kurdnasiyê li Yekîtiya Soviyetê dana. Qanatê Kurdo li 12ê Îlona sala 1909an li gundê Sûsîzê ser bi navçeya Dîgorê girêdayî qezaya Qersê, ji malbeteke cotkar ji dayîk bûye. Di dema şerê Cihanî yê Yekemîn de, malbeta Qanatê Kurdo jî mîna hezaran malbetên Kurdên êzdî yên Serhedê, mal û milkên xwe, welatê bav û kalên xwe dihelîn û ji ber zilm û zordariya Tirkan diçine Ermenîstanê. Piştî Şorêşa Oktobêrê artêşa Rûsîyê ji Qevqazê dikeve, artêşa Tirkan pareke Ermenîstanê dagîr dike û bi hezaran Kurdên êzdî qir dike. Ji malbeta Qanat tenê çend kes dimînin û ji ber wê qirîrîne xelas dibin. Ew bi neçarî dîsan koçberî dibin û berê xwe didine Tilbîsê ya ser bi Gurcîstanê.

Qanat xwendina xwe ya destpêkî li dîbîstanên wê deverê diqedîne. Wî bi roj karên dijwar ên paqijkirina pêlavan dikir, bi êvaran jî diçû dîbîstanê. Sala 1928an bi cehda Erebê Şemo, Komîta Navendî ya Partiya Komûnîst a Ermenîstanê 8 xortên Kurd bona xwendinê dişîne Lênîngrada Rûsîyê (Sankt-Pêtêrbûrga niha), yek ji wan xortan jî Qanatê Kurdo bû. Ew ji bo fêrbûna ziman destpêkê dikeve fakûlta karkeran û piştî temamkirina wê fakûltê xwendina xwe li zanîngehê berdewam dike.

Di wê demê de êdî zîrekiya wî berçav bû, bi xwendkariya zanîngehê re ew li fakûlta karkeran dibe mamoştayê zimanê Kurdî. Di sala 1933an



de wî bi Erebê Şemo re du gotarên zanyarî çap dike. Qanatê Kurdo Piştî tewawkirina xwendina bilind, serokatiya zanîngehê dixweze ku li zanîngehê de bimîne û lêkolînên li ser zimanê Kurdî berdewam bike. Ew yek daxweza dilê wî jî bû.

Li beşên Înstîtûya Rojhilatnasiyê yên Lênîngradê, Moskva yê û Êrêvanê beşên Kurdnasiyê hatin vekirin, li Bakû, Tbilîs, Semerqendê dest bi lêkolînên Kurdnasiyê dest pêkirin. Kabîneya Kurdnasiyê li beşa Lênîngradê ya Înstîtûya Rojhilatnasiyê di Şibata sala 1959an hat ava kirin û Rojhilatnas û Kurdnasê bi navûdeng û doştê gelê Kurd, Îosîf Orbêlî bû yekemîn Serokê wê desteya Kurdnasiyê. Lê piştî çend mehan serokatiya wê kabîneyê sparte Qanatê Kurdo, ku serokatiya wê Kurdnasiyê bike û wî jî ew kar heta dawiya jiyana xwe kir.

Bi serokatriya Qanatê Kurdo Kabîneya Kurdzaniyê bû navenda kurdzaniyê ya herî navdar li seranserê cihanê. Li wê Kabîneyê de, bi xemxwarî û serokatiya Qanatê Kurdo bû ku lêkolînên berfireh li ser ziman, dîrok û wêjeya Kurdî hatin kirin, berhemên Şeref xanê Bîdlîsî, Ehmedê Xanî, Mele Mehmûd Bayezîdî, Xosro Xanê Benî Erdelan, Meştûre Erdelanî, Herîs Bîdlîsî, Feqiyê Teyran û gelekên din bi orcînal û wergera zimanê rûsî hatine çapkirin, ser van berhemên lêkolînên zanyarî hatin kirin. Qanatê Kurdo bi xwe destpêkerê wan lêkolînan bû. Pênûsa Qanatê Kurdo gelek dewlemend bû, wî dor 85 pirtûk û gotarên zanîyarî çap kirin. Ew berhemên wî beşên Kurdzaniyê ji xwe ve digirtin.

Lê Qanatê Kurdo berî her tiştî zimanzan bû. Her di vê derheqê de perofesora zimanzan, Zara Elî Yûsûpova dinvîse: “Di çareserkirina pirsgerêkên rêzimaniya kurdî de Qanatê Kurdo yekmîn kes e”.

Qanatê Kurdo li sala 1934an li Êrêvanê beşdarê yekemîn konferansa Kurdzaniyê dibe û gotara “Bingehên rêzimana kurdî” dixwîne. Di wan deman de li rojnameya “Rêya Teze” çend gotarên wî li ser pîrsa zimanê kurdî dihatine çapkirin, lê sala 1936an pirtûka wî “Gramatîka Zimanê Kurdî ya Kurt” li Êrêvanê bi zimanê kurdî çap dibe. Ji sala 1949an pêde zarokên Kurdan li Ermenîstanê û Komarên dinê yên Yekîtiya Soviyetê bi pirtûkên wî yên amadekirî hînê rêzimana zimanê Kurdî dibûn. Pirtûka wî “Gramatîka zimanê Kurdî” ji bo dîbîstana destpêkê, ji bo dersxwanên pola 3 heta 8an heta sala 1985an gelek caran dihatin çapkirin.

Kurdzan û Zimanzan, Sûkêrman, di derheq wê pirtûka Qanatê Kurdo nivîsiye: “Serketina vê pirtûkê ev e ku bi şeweyekî zanîstî hatiye nivîsandin. Q. Kurdo ne tenê lêkolîna zimanê Kurdî kiriye, belkî wî rêya lêkolîn û fêrbûnê destnîşan kiriye”. Q. Kurdo bo cara yekemîn di wê pirtûka xwe de çend helbestên Cegerxwîn çap kirin, Kurdên Yekîtiya Soviyetê bi vê pirtûkê re helbestvanên Kurdan yên mezin nas kirin. Qanatê Kurdo piştevanê nasîyonalîzma Kurdan bû. Di dema dewleta Yekîtiya Soviyetê de, nasîyonalîzma wisa mêranî dixwest, lê Qanatê Kurdo xwediyê wê mêraniyê bû. Dema ku li 11ê Adarê li Silêmaniyê Zanîngeha Kurdî vebû, ji bo xwendina kûrseke ser zimanê kurdî Q. Kurdo hate vexwandin bo Silêmaniyê. Gelekî şa bibû, ew armanca wî ya salan bû ku berçavê xwe bidîtiba. Demeke dirêj xwe amade dikir. Lê çend rojan berî vê ku dixwest biçûya Silêmaniyê, jêre gotin

ku destûra çûyîna wî nedane. Wî zanibû ku ji ber Kurdperweriya wî îzn nedanê biçe Kurdiştanê û ew yek ji bo wî derbeke pîr giran bû. Wî, ku heta vê demê ti caran cigare nedikişa, piştî wê meselê dest bi kişandina cigarê kir. Çend mehan bi wî awayî di nav hundirê xwe de dikelijî, kêmdipeyivî, kêmdî mal derdiket. Di vê derheqê de Tosînê Reşîd gotiye: “Qanatê Kurdo ji wî re got, ku salên şerê Cihanî yê Duyemîn, gava artêşa Yekîtiya Soviyetê ketibû Rojhilatê Kurdiştanê, wî pîr dixwest ji bo berehevkirina matêriyalên ser zimanê Kurdî biçe Kurdiştanê. Lê wê demê jî rê nedane wî, çend Kurdên din hatine şandin”.

Qanatê Kurdo Komûnîst bû û wî yekemîn armanca xwe wek komûnîst di xizmetkirina gelê Kurd de didît. Gava 11ê Adara sala 1970an li Îraqê Akadêmiya Kurdî tê damezirandin, di yekemîn rojê de Qanatê Kurdo wek endemê kara tê hilbijartin. Sala 1974an, gava Yekîtiya Soviyetê bi gîştî piştî rêjîma Îraqê digire û medyayên Soviyetê herdem dijî Serokatiya Kurdan dinivîsîn, Q. Kurdo bi awayekî vekirî piştevaniya şorêşa Başûrê Kurdiştanê dikir û li her derê siyaseta Yekîtiya Soviyetê rexne dikir. Ji bo bîr û bawariyên wisa jî mêraniyekî mezin pêwîst bû û Q. Kurdo xwediyê wê mêraniyê bû.

Qanatê Kurdo di meydana Kurdzaniyê de xebatkarekî newest bû. Ew ti caran di derheq pîrsa Kurdan de bêdeng nema, ji ti kesî re serê xwe netewand. Di hemû jiyana xwe de ji bo paraştina berjewendiyên gelê kurd, ziman, dîrok û çanda gelê kurd bi mêranî xebat dikir. Havîna sala 1984an bi sedema nesaxiya penceşêr hate niştegerîkirin. Lê ew niştegerî nebû alîkarê wî û li 31ê Cotmeha sala 1985an dilê wî mirovê mezin û Navdarê Kurd ji lêdanê raweştiya û çû ser dilovaniya Xwedê. Qanatê Kurdo ji gelê xwe re mîrateke mezin hîşt.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Yekemîn salvegera xwenîşandana meha Xezelwerê hat û di Kurdiştanê de çendîn kes ji aliyê rejîma serkutkar ve hatine kuştin, birîndarkirin û binçavkirin

Par wan çaxan bi sedema bilindbûna nirxa %300 a benzînê, hejarî, bêhêvîbûn li rejîmê û bêkarî li 104 bajarên Îranê û 14 bajarên Kurdiştanê xelkê nerazî hatine serşeqaman û xwenîşandan kirin û bi tundî ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine serkutkirin. Di vê xwenîşandana xwînavî de li Kurdiştanê çî rûyda ye? Çend kes ji aliyê hêzên rejîmê ve bi awayekî dirindane hatine serkutkirin, di vê raporê de emê bi awayê amar pêşkêşê we bîneran bikin.

Amarek seraşt ku navenda amarî ya Saziya Kurdpayê li derheq salvegera wê xwenîşandanê li Rojhilatê Kurdiştanê de belav kiriye wiha ye:

Kesên ku hatinî kuştin: 44 kes

Binçavkirirî: 245 kes

Dana ceza: Zêdetir ji 50 sal û 30 derbe qamçî bo 17 kesan

Amara kuştî û birîndarbûyên meha Xezelwera 1398an pêka bajar û parêzgehên Rojhilatê Kurdiştanê ku ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine kuştin û birîndarkirin wiha ye:

Parêzgeha Kirmaşan: Li bajarê Kirmaşanê 16 kes hatine kuştin

Ciwanro 7 kes, Rewanser 1 kes. Bi giştî li parêzgeha Kirmaşanê 24 kes hatine kuştin.

Parêzgeha Sine: Merîwan 8 kes, Sine 2 kes, Kamiyaran 1 kes. Li parêzgeha Sine bi gelemper 11 kes hatine kuştin û 5 kes birîndarkirin.

Parêzgeha Îlamê: Li Îlamê 1 kes kuştin.

Li Parêzgeha Urmîyê: Li bajarê Bokanê 3 kes hatine birîndarkirin.

Li bajarên din ên Îranê ku welatîyên Kurd têde hatine kuştin wiha ye: Li bajarê Kerec û Tehranê 8 kes hatine kuştin. Bi gelemper 44 kes xelkên Rojhilatê Kurdiştanê di wê xwenîşandanê de ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine kuştin û 8 kes jî hatine birîndarkirin.

Hejmara Kurdên ku di wê xwenîşandanê de hatine girtin wiha ye:

Parêzgeha Kirmaşan: Di bajarê Kirmaşanê de 23 kes, Ciwanro 53 kes, Serpêla Zehav 7 kes, Selasê Bawecanî 5 kes.

Di parêzgeha Sineyê jî wiha ye: Bajarê Sineyê 69 kes, Merîwan 47 kes, Seqiz 10 kes, Kamiyaran 5 kes, Bane 1 kes.

Parêzgeha Îlam: Tenê li bajarê Îlamê 4 kes.

Parêzgeha Urmîyê: Bajrê Urmîyê 10 kes, Bokan 6 kes, Xoyê 1 kes.

Welatîyên Kurd yê li bajarên di ên Îranê hatine girtin wiha ne:

Kelardeşt Mazenderanê 1 kes, Îsfahan 1 kes, Kurdkoya Gulîştan 1 kes, Kerec 1 kes.

Bi gelemper 246 kes ji aliyê hêzên rejîmê ve di nav xwenîşandana meha Xezelwerê de hatine girtin.

Fermandeyên Întizamî yê rejîma Îranê dane xuya ku 294 kes wekî lîderê aloziyan binçav kirine.

Binçavkirina 2 birêveberê Telegramî li Îlamê

Binçavkirina 7 lîder li bajarê “Çîrdawil”ê

Binçavkirina 12 lîderên xwenîşandanên Kirmaşan û Civanro

Binçavkirina 240 welatîyên nerazî li Kirmaşanê

Binçavkirina 25 welatîyan li Merîwan û Sinê

Binçavkirina 8 kes li Merîwanê

Tê berevirdkirinê ku di Kurdiştanê de, di navbera 1,000 heta 2,000 kes hatine binçavkirin

8 kes ji wan binçavkiriyan jin in.

Ajansa Nûçegihaniya Ruytîrîzê dabû zanîn ku di xwenîşandan meha Xezelwera 1398an a Rojî de 1500 kes xelkê nerazî li tev Îranê de ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine kuştin.

Sino/ Du kolberên Kurd bi teqeya hêzên leşkerî hatine kuştin

Roja Çarşemî 28ê Xezelwerê, du kolberên Kurd yê bi navên “Wesîm Ferdînzade” kurê Husên xelkê gundê “Pirdavê” yê ser bi bajarê Şinoyê û “Hakan Mihemedzade” kurê “Elaedîn” xelkê gundê “Kerîkan” yê ser bi devera Şipêran a bajarê Silmasê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê li ser sînorê bajarê Şinoyê canê xwe ji deşt dan.

Hêzên leşkerî bi bê aghdarkirina berê teqê ji wan kolberan kirine.

Ew du kolber “bi bê hebûna barê qaçax” raştî teqeyê hatine.

“Wesîm Ferdînzade û Hakan Mihemedzade” xêzandar in û bavê zarokan e.

Rejîm bi bê terorê nikare bijî

